Dr. Ehmed Xelîl	 ***Werger: Heyder Omer***

Kurdistan berî her tiştî

Xelek 2
Ev kûrahiya me ya jiyosteratîcî ye

Pêşî, jiyosteratîcîk:

pelandina bûyera dîrokî, bi awayê automatik û dûrî hêmanên, ku ew bûyer peyda kirine, nagihîne encamên durist, çi ew hêmanan jiyosteratîcîk bin, û çi jî oplîtîkî, çandî, civakî û aborî bin. Divê li ber ronahiya vê rastiyê mirov li gel talan û dagîrkirinên, ku li dirjahiya dîrokê bi ser Kurdistanê de hatine, bide û bistîne û têkildar bibe, û li ber wê ronahiyê jî divê realîteya Kurdistanê were şînkirin û schirovekirin.

Bi ser ku Kurdistanê gelek sermiyanên zevî û şivanî û maden û av hene, ew hêmanên ku avê bi devên talankeran dixin û wan dikêşin. Bi ser wan de hêmanê jiyosteratîcîk ê giring jî heye. Leznerînek li erdnîgariya Kurdistanê (şûna Kuristanê) li rojavayê Asiyayê, dikane van rastiyên jêrîn bide pêş me:

- Şûna Kurdistnê di navbera çar deryayên giring de li rojhilata navîn: Derya Qezwîn, derya Reş, kendava Somerî (parsî / erebî tê nasîn), û derya Sipî.

- Şûna Kurdistanê di navbera çar deverên giring de li rojhilata navîn: Devera Aryana li hêla rojhilat, Anadol û rojhilatê derya Sipî li hêla rojava, Qevfasiya li hêla bakur, û Mîzopotamya li hêla başûr.

- Çiyayên Zagros û yên Toros marpişta Kurdistanê ne; ev çiyan wek keleheke gelekî bilind û hêzadar orta Asyayê ji rojavayê wê dibire.

- Her du oqyanosên Bosfor û Derdenîl Ewropayê û rojavayê Asiyayê li gel hev dibestînin, û riyên Kurdistanê jî rojavayê Asiyayê û navend û rojhilatê Asiyayê li gel hev dibestîn, û berevajiya vê yekê jî rast e.

Kurdistan, bi sedema vî cuhê jiyosteratîjîk, ji pênc hezar sal de, bûye armanca her hêzeke mezin û xwedî pirojeya firehî û dagîrkirinê li rojavayê Asiyayê, û ne ji lêhatinê ye, ku hinek navdartirînên cengan di dîrokê de li ser xaka Kurdistanê qewimîn.



Nimîne ji dîrokê: Em hinek nimûneyên, ku giringiya şûna jiyosteratîcîk ya kuridistanê, diyar dikin, li jêr rêz dikin:



- Cenga Gugamêla: Ev ceng sala (331 b.z) li deşta Hewlêrê qewimî. Qeraqlê pars ê exmînî Dara yê sêyem di vê cengê de baz da, û Îskenderê Mekdonî (mezin) bi ser ket, û di pey re jî Persîpolîs a paytext (textê Cemşîd) bindest kir û şewitand, û pê re çû heya gîha Efganistan û bakurê Hindistanê(1).

- Cenga Nehawend: Her du artêşên Ereban û Parsan di vê cengê de sala (20 k / 640 z) rû bi rû bûn, qeralê SasanYezdegirdê sêyem baz da, û artêşa ereban bi ser ket, û dest dan ser tevahiya împertetoriyê, vê lomê jî dîroknivîsên misilman vê cengê bi (Fethûlfitûh / فتح الفتوح) navandin, ji ber ku Nehawend, ji bo kûrahiya împeretoriyê, enaiy bervedêriyê bû. Beriya wê jî Ereb di her du cengên Hulwan (Elwend) û Celûlayê de bi ser ketibûn, û Sasanan baz da bûn, ev her du bajar li başûrê Kurdistanê dikevin. Di pey re jî Ereban dan ser riyên, ku Îskender tê re çû bû, û bi pêş ve çûn(2).



- Cenga Melzgurd: Ev ceng sala (1071 z) di navbera siltanê Sulcûq Elb Erselan û împeretorê Bîzenta Romanos de qewimî. Artêşa sulcûqan bi ser ket, û Romanos jî hat dîlkirin, pê rê jî Enadol li pêş Sulcûqan vebû, û bajarê Qustentîniye kete ber gefûgurên wan. Divê ji bîra nebe, ku Osmanî, li derdora sala (1300 z), ji dibistana talanê ya sulcûqan derçûn(3).

- Talana Mengolan: Gava Mengolan, di yekemîn çarîna sedsala (13 z) de, bi serperştiya Holago, dest bi talana rojavayê Asiyayê kirin, Kurdistan, di rûwê wan de, derbendê xweristî bû, vê lomê neçar bûn, ku dest bidin ser Kurdisatê, eger wusa nekiribana, nikanîbûn Mîzopotamya dagîr bikin, û ber bi Enadolê û Sûryeyê biçin, û bigihênin delavên deryaya Sipî(4).

- Cenga Çaldîranê: Ev ceng sala (1514 z) di navbera Osmaniyên Sune, bi serperştiya siltan Selîmê yekem, û dijminê wî yê şî-î şah Simaîlê Sefewî de qewimî, sefewî têk çûn, û Osmanî bi ser ketin, û di pey re Îraq û Şam û Misir dagîr kirin, û di rojhilata navîn de bûn serdestên hêzdar(5).



- Ne ji lêhatinê bû, ku Xaçeperstan, beriya ber bi Sûryeyê û Lubnan û Felestînê de herin, û sala (1099 z) Qudsê dagîr bikin, yekemîn mîrnişîna xwe li Rehayê (Urfa /Edîsa); bakurê Kurdistanê sala (491 k / 1098 z) ava kirin(6).

- Ne ji lêhatinê bû, ku Îngilîzan li gorî peymana Saykis – Pîko sala (1916 z) başûrê Kurdistanê dagîr kirin, û paşê jî bi ser dewlta Îraqê ve kirin, û Firansizan jî rojavayê Kurdistanê dagîr kirin, û paşê jî qayîl bûn, ku tev li Sûryeyê bikin.



- Ne ji lêhatinê bû, ku Rûsiya, hem di serdema qeral /qeyser de, û hem di serdema Sevyet de, bi her awayî hewl bida, da bandora xwe bikşîne ser gelek deverên rojhilat, bakur û başûrê Kurdistanê, her weha avakirin û şikestina komara Kurdistanê li Mehabadê, û nakokiyên Kurd li dij Aşûriyan û Ermenan hinek ji encamên çavberdana Rûsiya bi ser Kurdistanê de bû, ji hêla jiyopolîtîkî de.

Ev nimûne yên jorîn û hinekên din jî, dupat dikin,ku giringiya şûna jiyosteratîcîk ya Kurdistên rastî ye, û ne vir û vût e. Rastiyeke dîrokî û hemdemî ye, Kurd baceya wê dane û hîn jî didin, nemaze gava nikarîbûn dewleta, ku wan bide ser hev, û têkiliyên wan li gel dewletên din,li herêmê û li cîhanê, bi rê ve bibe, damezrînin. Ev realîte giringtirînê sedeman e, ku dagîrkerên Kurdistanê (Îran, Tirkiya, Îraq û Sûriyê) li dij avakirina dewleta Kurdistan a xweser radibin. Bi avakirina dewleta Kurdistan a xweser re dê nirxê van dewletên dagîrker, di bazar polîtîka navdewletî de, erzan bibe, û heye jî gelekî sivik bibin.

Piştgiriya Kurd ji bo pirojeyeke rizgarî isteratîcîk, û damezrandina lêvegera (rêvebirî), ku vê pirojeyê bîne piratîkê, û têkiliyên miletê Kurd li herêmê û li cîhanê bi rê ve bibe, dê vê şûna isteratîcîk a Kurdistanê, di dest xwe de bike kerta herî nirxbiha, ji dêvla ku di destên dagîrkeran de bimîne, da di bazaran de, li hember hêzên mezin, bi kar bînin.

Û çi dibe jî, bila bibe, divê Kurdistan rizgar bibe.

***** *** *****

Jêder û çavkanî:

(1) Wîlyam Langer: Mewsuet El-Tarîx El-Alem, 1/94.
(2) El-Teberî: Tarîx El-Rusul we El-Mulok, 4/135, Ibin El-Esîr: Elkamêl fî El-Tarîx, 2/ 399. El-Belazurî: Futoh El-Buldan, rû 260 – 261.
(3) Ibin El-Esîr: Jêdera navborî, 8/223. Yêlmaz Oztona: Tarîx El-Dewle El-Osmaniyye, 1/88: Birahîm Beg Helîm: Tarîx El-Dewle El-Osmaniyye, rû 49.
(4) Ibin El-Esîr: Jêdera navborî, 127 499/500. 49. El-Hemezanî: Camêi El-Tewarîx, 1/250 – 258, 261, 319-320.
(5) Ibin Eca: El-Îrak beyne El-Memalîk we El-Osmaniyyîn El-Etrak, rû 230.
(6) Mihemmed Sûheyl Teqqoş: Tarîx El-Fatîmiyyn, rû 426.